Serokwezîrê Mesrûr Barzanî got: Hikûmeta Herêma Kurdistanê pabend e bi parastin û pêşxistina pêkvejiyanê hevbeş ku yek ji taybetmendiyên Herêma Kurdistanê ye, em bi serbilindî berevanî û parastina vê çanda ciwan dikin û emê rûbirûyê her cure hizra tundrew û cudakariyê bibin." Amaje bi wê kir: "Di van demên dawî de hewl hat dayîn ku mafên pêkhatiyên Herêma Kurdistanê ji aliyê hin hêzên navxweyî û sazîyên federal ve bîna bînpêkirin, me bi hemû hêza xwe rûbirûyê van hewldan û planan bû û di dawiyê de hinek mafan ji dest hatine standin, hatin veqerandin. Di xula bê ya Parlamentoya Kurdistanê de, em hêvîdar in ku maf û nûneratiya pêkhatiyên Kurdistanê di warên parlemantî û îdarî yên Herêma de bi awayekî hêjatir bîna çespendin."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê got: "Hêvîdar im ku em bi hev re kar bikin, ji bo zêdetir geşkirin û xurtkirina giyanê pêkvejiyanê, çespendina aştiyê, tebayî, prensîbên demokratîk, hevduqebûlkerin û rêzgirtina ji nixê pîroz re, ku welatê me zêdetir pêşde bibe û qewareya destûrî ya Herêma Kurdistanê biparêze."

Mesrûr Barzanî di dawiya gotara xwe de jî got: "Careke din destxweşiyê li we dikim ji ber lîdarxistina van konferansan û em soz didin ku wek her tim, em girîngiyê bidin ziman û çanda Suryanî û kultur û çanda hemû pêkhatiyên Kurdistanê. Gelek spas ji bo amadebûna we, bila hûn şad û serketî bin û welatê me jî her awedan be."


Çavkaniyek ji ofîsa Mela Bextiyar: Me nehişt hêza komando ya YNKê mêvanxaneyê me dagir bike

Çavkaniyekî li ofîsa Mela Bextiyar aşkera kir, hewl-daneke hêzên komando yên YNKê ji bo dest bi serdagirtina mêvanxaneyê Mela Bextiyar a li Xaneqînê hatiye şikandin û naha hêzên ser bi Mela Bextiyar ketine rewşa amadebaşiyê.

Çavkaniyekî ji ofîsa Mela Bextiyar ji BasNewsê re ragehand, îro 05.09.2024ê hêza komando ya YNKê çûn ser mêvanxaneyê Mela Bextiyar a li Xaneqînê û xwestin kontrol bikin, di wê demê de jî hêzeke parêzvan ên ser bi Mela Bextiyar li wê derê bûn û nehiştin û piştê Mela Bextiyar ji rewşê hate agahdar kirin.

Heman çavkaniyê diyar kir hemû hêzên ser bi Mela Bextiyar ketine rewşa amadebaşiyê û beşek ji wan naha li pêş "Binkeyê Rewşenbîrî ya Çavdêr" in ku binkeyekî ser bi Mela Bextiyarê û amadene ji bo her egerekî.

Ji aliyê xwe ve rojnamevan li Silêmaniyê Beşdar Bazyanî jî di tora xwe ya civakî facebookê de ragehand, şeva borî hêzeke komandoyên YNKê plana wan




hebû bavêjin ser mal, binke û mêvanxaneyê Mela Bextiyar a li Xaneqînê û dagir bikin.

Li gor gotina heman rojnamevanî Mela Bextiyar gelek aciz bûye û gefa helwêstê tund xwariye û heta cuda kirina baskekî ji YNKê jî. Dawiyê de jî got: "Destwerdan li bûyerê hatiye kirin û hêza komando hatiye rawestandî."

Şingalî dixwazin veqerandin ser cih û warên xwe lê nikarin

Jiyana koçberên Şingalê yên li de mane, eger tîmeke taybet ava kampan ku li benda asayîbûna bibûya, dikarîbû beşek ji wan



rewşa bajarê xwe û vegera wan bo malên xwe ne, gihîştîye asteke wisa ku êdî hêviya wan a veqerandinê nemaye, ji ber vê yekê, ew mayîna li kampan, ji vegera bo bajarekî wêrankirî ku bûye leşkergeh, ewletir dibînin.

Koçberê Şingalî Şakir Heyalî ji K24ê re got: "Jiyana koçberan li kamp û bajaran di zehmetiyê de ye. Ji aliyekî din ve, beşek ji keç û jinên Şingalê di bin destê DAIŞê

keçên Êzidî ji destê DAIŞê rizgar bibûna. Koçberên di kampan de zêde guh bi wan nayê dayîn, divê hikûmeta Iraqê zêdetir û baştir xema koçberên Şingalê bixwe."

Jiyan û çarenivîsa koçberan, bûye mijareke germ a konferanseke hevbeş a Hikûmeta Herêma Kurdistanê, Wezareta Koç û Koçberan a Iraqê û şandekê Rêxistina Navdewletî ya Koçberan (IOM) li Iraq û Kurdistanê. Di

gotubêjan de bal hat kişandin ser dayîna alîkariyên zêdetir û şayeste ji bo koçberan.

Rêvebirê Şaxa IOM'ê ya Iraq û Herêma Kurdistanê George Gikauri got: "Em bêguman dixebitin ku aramî li herêmê vegere û koçber veqerandin malên xwe. Ji ber ku pêwîstiya wan bi aramî û xizmetguzariyên baştir heye, heta niha hikûmeta Herêma Kurdistanê bi sîngeke berfireh û helwesteke mirovî alîkariya wan dike."

Rêveberê Zanyarî û Pêwendiyar yê Navenda Hevbeş a Krîzê ya Wezareta Navxwe jî Elî Seîd got, kampên koçberan bi awayekî rasthatinî nayên girtin, kamp dê berdewam bin. Ev jî bû sedema betalkirina biryara Wezareta Koç û Koçberan a Iraqê ya girtina kampan di 30ê Tîrmehê de.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ev 10 sal in ji bo çareserkerina pîrsgirêkên xelkê û koçberên Şingalê û vegera bo warên xwe, hevahengî ligel hikûmeta Iraqê û Neteweyên Yekbûyî kiriye.

Nêçîrvan Barzanî piştevaniya Herêma Kurdistanê ji bo Balyozê Tirkîyeyê tekez dike



Serokê Herêma Kurdistanê piştigirîya Herêma Kurdistanê ji bo Balyozê nû yê Tirkîyeyê li Îraqê di erkê wî yê nû de tekez kir.

Li dû ragehandina Serokatiya Herêma Kurdistanê, Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro (Sêşem, 03.09.2024) di

hevdiînekê de bi Balyozê nû yê Tirkîyeyê li Îraqê Anil Bora re tevî bixêrhatinê, daxwaza serkeftinê di erkê wî yê nû de jî re xwast û hemî piştigirîya Herêma Kurdistanê ji bo biserxistina erkê wî diyar kir. Balyozê nû yê Tirkîyeyê li Îraqê Anil Bora ji aliyê xwe ve dilxweşiya xwe ji bo destpêkirina karî wekî balyozê welatê xwe li Îraqê diyar kir, herwesa hez û amadehiya Tirkîyeyê ji bo berdwamkirina peywendiyên xwe bi Îraq û Herêma Kurdistanê re di hemî waran de tekez kir.

Rewşa navxwe ya Îraq û Herêma Kurdistanê û dawî pêşatên deverê bi awayekî giştî jî mijarên tewerekê din ê wê hevdiîtinê bûn.

Bi amadebûna Serokwezîr Mesrûr Barzanî Pêşangeha HITEX 2024 tê vekirin

Bi amadebûna Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, 5emîn Pêşangeha



Navdewletî ya Teknolojiyê ya Hewlêrê (HITEX 2024) tê vekirin.

Bi amadebûna Serokwezîr Mesrûr Barzanî, îro 3ê Îlonê, 5emîn Pêşangeha Navdewletî ya Teknolojiyê ya Hewlêrê (HITEX 2024) bi sponseriya medyayî ya Kurdistan24 dest pê dike.

Bi amadebûna kompanya, çendîn berpirsên pilebilind ên hikûmeta Herêma Kurdistanê, hikûmeta navendî û çendîn konsulên welatan, 5emîn Pêşangeha Navdewletî ya Teknolojiyê ya Hewlêrê îro dest pê dike û çar rojan berdewam dibe. Pêşangeha Navdewletî ya Teknolojiyê ya Hewlêrê (HITEX), mezintirîn pêşangeh û konferansa salane ya li Iraqê ye. Herwiha dehemîn pêşangeha herî mezin a li Rohhilata Navîn e û bi hevahengiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê tê lidarxistin. Rêveberê pêşangehê Ferheng Bira-dostî ji ajansa K24ê re got: "Îsal zêdetirî 150 kompaniyên ji 21 welatan dê beşdarî pêşangehê bibin. Em pêşbînî dikin ku zêdetirî 50 hezar kes serdana pêşangeha me bikin."

Biradostî got: "Hitex ji bo karsazan rêyek nû ye ku bi pêşandana berhem û karûbarên xwe yên herî dawî. Bi sedan kompaniyayên teknolojiyê yên herêmî û navneteweyî li Hitexê berhemên xwe yên herî dawî nîşan didin."

Herwiha got: "Hitex rê dide beşdaran ku danûstendin û hevkarîyên karsaziya navxweyî û navneteweyî biafirînin. Di rojên Hitex de, beşdar bi kiryarên xwe re têkel dibin û têkiliyên rasterast di navbera rêveber û kiryanan de çêdibin."

Li gor Bradostî ev pêşangeh dê sektora geştîyariyê li Hewlêrê vejîne ku di çar rojên pêşangehê de, her sal bi hezaran geştîyar ji başûrê Iraqê û herêmê serdana Hewlêrê dikin. Rêveberê pêşangehê got jî, li her çar rojên pêşangehê, Konferans Hitexê, 7 panel, 3 semîner û 2 workşopên tê lidarxistin. Her rojê dê behsa mijarek taybet bike, wek teknolojiya çandiniyê, jîriya çêkirî, teknolojiya darayî û karsaziya teknolojiyê.

Rayedarên pilebilind ên Iraq û Herêma Kurdistanê dê bicivin

Encûmena Wezîrên Karûbarên Aborî yên Iraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê dê roja Yekşemê li



Hewlêrê bicivin.

Şandeke Iraqî bi serokatiya Cîgirê Serokwezîrê Iraqê Fuad Husên li Hewlêra paytext bi rayedarên hikûmeta Herêma Kurdistanê re hevdiînekê pêkanî. Di şanda Serokwezîrê Iraqê de Cîgirê Serokwezîr û Wezîrê Plandanîyê Muhammed Elî Temîm, Wezîrê Darayî Teyif Samî, Wezîrê Bazirganiyê Esîr Dawid Selman, Wezîrê Kar û Karûbarên Civakî Ahmet Casim Sabîr, Sekreterê Giştî yê Serokwezîrê Iraqê Hamid Nayim, Serokê Banka Navendî ya Iraqê Alî Allaq û gelek berpirs beşdar bûn.

Di civînê de mijarên darayî û siyasî yên navbera Hewlêr û Bexdayê hatin gotûbêj kirin.

Neteweyên Yekbûyî serlêdana Diakurdê ya ji bo Peymana Lozanê qebûl kir

Hewlên Konfederasyona Kurdên Diasporayê (Diakurd) yên ji bo dadgehkirina Tirkîyeyê û neheqiyên ku di Peymana Lozanê de li Kurdan hatine kirin derbasî qada navneteweyî dibin.

Parêzerên Diakurd Hişyar Ozalp û Ridvan Dalmîş 2yê Gulana 2023yan ji bo mafê diyarkirina çarenivîsa xwe yê Kurdan ê ku di Peymana Lozanê de hatiye paşguhkirin, were pêkanîn, serî li Kabîneya Serokkomariya Tirkîyeyê dabû.

Diakurdê bi vî awayî pêvajoyeke hiqûqî dabû destpêkirin.

Parêzerên Diakurdê, ji ber ku di dema yasayî de ti bersiv nehat dayîn, mijar bir Dadgeha Bilind a Tirkîyeyê.

Parêzerên Diakurdê, bi daxwaza betalkirina Peymana Lozanê û daxwaza "mafê xwe birêvebirina neteweya Kurd" serî li Dadgeha Bilind a Tirkîyeyê da.

Parêzerê Diakurdê Hişyar Ozalp derbarê vê mijarê ji ajansa Rûdawê re axivî.

Hişyar Ozalp wiha got: "Dadgeha 6emîn a Îdarî ya Enqereyê diyar kir ku mafê Kurdan ê diyarkirina çarenivîsa xwe li dijî hebûna dewleta unîter û çar xalên ewil ên destûra bingehîn e.

Dadgehê her wiha diyar kir ku di nav sînorên Komara Tirkîyeyê de, ti otorîteya giştî ya ku karibe vî mafê Kurdan binirxîne nîne.

Me îtirazî vê biryarê kir. Dadgeha 10emîn a Îdarî ya Herêma Enqereyê jî biryara dadgeha îdarî rewşa dît û daxwaza me red kir.

Bi vî awayî rêyên hiqûqî yên navxweyî qediyên û biryara teqez hat dayîn"

Ozalp da zanîn ku wan piştî ku ji rêyên navxweyî encam wergirt serî li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî da û wiha domand: "Me di serlêdana xwe de diyar kir ku her çi qasî heyeta Tirk di Peymana Lozanê de soz dabû ku Kurd jî wekî Tirkan bibin xwediyê heman mafan û bi hev re Tirkîyeyê îdare bikin jî piştî avakirina Komarê ev soz nehat bicihanîn.

Me îdia kir ku Kurd di pêvajoyên biryardayîne de cih nagirin û mafên wan ên kolektîv nayên naskirin û bi politîkayên asîmilasyon û tune kirinê re rû bi rû man."

"Bakurê Kurdistanê bi pêvajoyeke îdarî ya asayî nehat birêvebirin"

Ozalp eşkere kir ku wan di serlêdana xwe ya li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî de gotiye ku Tirkîyeyê xala 5emîn a Peymana Mafên Sivîl û Siyasî bin pê kiriye û wiha dewam kir: "Her wiha me diyar kir ku ji salên destpêkê yên Komara Tirkîyeyê ve Bakurê Kurdistanê bi rêbazên îdarî yên awarte tê birêvebirin.

Di nav van pêvajoyên birêvebirîya

awarte de çavdêriya giştî, yasaya leşkerî û pratîkên rewşa awarte û tayînkir-



inên qeyûman ên îro jî hene.

Bakurê Kurdistanê bi pêvajoyên îdarî yên normal nehatiye birêvebirin.

Em li dijî biryarên dadgehên Tirkîyeyê derketin ku mafên Kurdan li dijî çar madeyên ewil ên destûra bingehîn û hebûna dewleta unîter qebûl dike.

Hiqûq û peymanên navneteweyî garantî kirine ku mafên miletekî bi mafên serwerî yên dewleteke din nayê sîno darkirin û mafên neteweyî yên Kurdan jî nayên binpêkirin.

Lewma ev helwesta Komara Tirkîyeyê li dijî hiqûqa navneteweyî ye.

"Me diyar kir ku hebûna Kurdan nayê qebûl kirin"

Ji ber ku Komara Tirkîyeyê mafê Kurdanê di diyarkirina çarenivîsa xwe ya navxweyî nas nake, êdî neçar bûye ku Kurd mafê çarenivîsa xwe ya derve, yanî mafê veqetandinê bi kar bîne.

Me diyar kir ku ji ber ku mafê Kurdan di birêvebirina çavkaniyên xwe yên aborî, bikaranîna mafên ziman û çandî de nayê naskirin, ji ber vê yekê mafê cudabûnê êdî bûye pêwîstiyek.

Me di serlêdana xwe ya li Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî de îdia kir ku Tirkîyeyê xala 5emîn a Peymana Navneteweyî ya Mafên Sivîl û Siyasî bin pê kiriye.

Me bal kişand ser 5 xalên Peymana Navneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî wekî:

Xala 1ê derbarê mafê çarenivîsê ye, Xala 2yan têkildarî pêkanîna peymanê di hiqûqa navxweyî de ye, Xala 25an derbarê mafên demokratîk e, Xala 26an li ser wekhevîya li pêşberî qanûnê û qedexekirina cihêkariyê ye, Xala 27an têkildarî mafên pêkhatayan e.

Li ser van xalan me da zanîn ku li gorî Xala 66emîn a Destûra Bingehîn a Komara Tirkîyeyê ji ber ku her kes Tirk tê hesabandin hebûna Kurdan nayê qebûl kirin.

Me diyar kir ku nêzîkatiya pergala

serwerîya Tirk a ku hebûna Kurdan înkâr dike li dijî ruhê peymanê ye."



"Em li bendê ne ku mafê Kurd ên dewletbûnê nas bikin"

Ozalp diyar kir ku Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî bi hejmara kodê serlêdana wan qebûl kiriye û wiha pê de çû:

"Têkildarî pêvajoya paşerojê serlêdana me hat qebûl kirin lê belê ev nayê wê wateyê ku daxwazên me tên qebûl kirin.

Li gorî prosedurê, serlêdana me ji bo vekoîlînê hat qebûl kirin û hejmarek jê re hat dayîn.

Îdiayên me dê di vê qonaxê de ji Komara Tirkîyeyê re bên şandin û îfadeyên wan bî wergirtin. Piştî komîsyonê dê biryarê bide.

"Em hêvî dikin ku Neteweyên Yekbûyî derbarê Kurdan tesbîtin xwe bike"

Em li bendê ne ku Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî mafê çarenivîsê û dewletbûna Kurdan nas bike.

Ev mijareke li derveyî desthilata komîteyê ye.

Lê em li bendê ne ku ev sazî nixandineke hiqûqî bike û diyar bike ku di dîrokê de neheqî li Kurdan hatiye kirin, mafê çarenivîsê heye lê nehatiye bicîhkirin û ji bo pêşîgirtina li naskirina mafên kolektîv ên Kurdan hin tedbiran wergire. Hêviya me ya sereke ev e.

Cara yekem e Kurd bi daxwazên wiha serî li saziyê Neteweyên Yekbûyî didin.

Em li bendê ne ku ev saziya dadwerî ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî derbarê Kurdan de tesbîtin girîng bike. Ev rewşeke gelekî girîng e."

Parêzer Ridvan Dalmîş jî 13ê Tebaxa 2023yan gotibû:

"Her çend navê vê peymanê aştî be jî ji bo me Kurdan tenê mirin û eş anîne.

Armanca Lozanê ew bû ku Kurd heta hetayê mafê diyarkirina çarenivîsa xwe ji dest bidin.

Her wiha xwestiye bi asîmîlekirina

Serokwezîr Mesrûr Barzanî Zanîngeha Navdewletî ya Brîtanayê li Hewlêrê vedike

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 7ê Îlonê Zanîngeha Navdewletî ya Brîtanayê li



Hewlêrê vedike. Di dema danîna kevîrê bîngêhîn ê Zanîngeha Navdewletî ya Brîtanayê di sala 2022an de, Serokwezîr Mesrûr Barzanî gotibû, Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêşxistina sektora zanistî, kiriye beşek ji karên xwe yê pêşîne.

Herwiha got: "Ev zanîngeh wek şaxek ji zanîngeha Londonê ye, ku zanîngehek bi navûdeng a navdewletî ye, hêvîdar im zêdetir xizmeta perwerde û zanistê li Herêma Kurdistanê bike."

Hewldana Edeletê ya li Dijî Tecrîdê: Em Tirkîyeyê vedîxwînin edaletê

Hewldana Edeletê ya li Dijî Tecrîdê got ku tecrîda mutleq a li Îmraliyê hemû nîrxên hiqûqê bînpê dike û got, "Em bang li her kesî dikin ku bertek nîşanî tecrîda Îmraliyê bidin



te Karsî Adalet Giris

û Tirkîyeyê vedîxwînin edaletê."

'Hewldana Edeletê ya li dijî Tecrîdê' ji aliyê gelek hiqûqnas û aktîvîstan ve li dijî bînpêkirinên mafan yê li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û girtiyên siyasî hat avakirin, li Amedê Navenda Çanda Dicle Firatê daxuyaniyek da. Gelek hiqûqnas, Meclîsa Dayikên Aştiyê, Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) tevî daxuyaniyê bûn. Hevberdevkê Komîsyona Hiqûqê ya DEM Partî û Komîsyona Mafê Mirovan Ozturk Turkdogan daxuyani xwend. Ozturk da zanîn ku 44 mehe agahî ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nayê girtin û got: "Tecrîda giran ya li Îmraliyê di rapora 5'ê Tebaxa 2020'an a CTP de bi eşkere hatiye vegotin û diyar dike ku divê demidlest ev tecrîd bidawîbe. Ligel vê Komîteya Mafê Mirovan a NY'ê di 6'ê Îlona 2022'an de biryara tedbîrê da û li gorî vê biryarê di 19'ê Çileyê 2023'an de ji bo hikûmeta Tirkîyeyê nivîs hatiye nivîsin. Di van nivîsan de jî tê diyarkirin ku divê demidlest ev teşeyê eşkencyê bidawî be. Xala 3'emîn a Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê û xalên 6,8, 13 û 18'an ên bînpêkirin."

Ozturk bi lêv kir ku wê Konseya Ewropayê dosya derbarê tecrîdê de ji nûve bigire rojeva xwe û got: "Pêşniyarên Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ya di 2021'ê de ji bo Tirkîyeyê hatibû kirin jî nehatin cih. Di meha Îlonê de wê komîte dosyayê ji nûve bigire rojeva xwe û bînxîne."

Ozturk axaftina xwe wiha berdeham kir: "44 mehe agahî ji Birêz Ocalan û girtiyên din yê li Îmraliyê nayê girtin. Der barê hevdîtinan de tu tiştek tune. Serlêdanên parêzeran her tim tînin redkirin. Bi hinceta cezayên dîsîplîne tînin redkirin. Qebûlkirina vê rewşê ne pêkane."

Ozturk destnîşan kir ku berdehamirina tecrîda li Îmraliyê dibe sedema astengiya li pêş çareseriyê pîrgirêka Kurd û wiha bi lêv kir: "Di mijara çareseriyê pîrgirêka Kurd de di navbra 1993-2015'an de 8 caran hewldan pêk hatine û di hemûyan de jî Birêz Ocalan wek muxatabê gelê Kurd cih girtiye. Ji 2015'an de hewldan hatine rizandin. Vê pêvajoyê de rejîma Tirkîyeyê veguheriyê rejîmeke otorîter. Neçareseriyê pîrgirêka Kurd jî tecrîdê didomîne. Ji bo rakirina tecrîdê em ê bi hemû sazîyên civaka sîvil re hevdîtinê bikin. Em hemû kesî vexwendî dikin ku li dijî vê tecrîda giran berteka xwe nîşan bidin. Em bi vê vexwendiyê xwe li dijî tecrîdê edaletê dixwazin. Em Tirkîyeyê ji nûve vexwendiyê edaletê dikin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Me karê cidî ji bo rûbirûbûna gendeliyê kiriye

Bi amadebûna Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro 4ê Îlonê, merasîma ragihandina yekem raporta cibicîkirina stratejiya rûbirûbûna gendeliyê li Herêma Kurdistanê birêve diçe. Serokwezîr di gotarekê de ronahî xiste ser hewlên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo rûbirûbûna gendeliyê.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di gotara xwe de got: "Rûbirûbûna gendeliyê û sîno-darkirina îsrafkirina samanên giştî, beşeke girîng a karnameya Kabîneya Nehem bûye, ji ber vê yekê me bi awayekî cidî kar kir û rêkarên pêwîst ji bo pêşxistina zelalbûn û rûbirûbûna gendeliyê girtin. Di vî warî de, ji bo têkoşîna li dijî gendeliyê wan bi Desteya Destpakîyê ya Herêma Kurdistanê re, wek desteyek serbixwe hevaheng kiriye.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Ev rapor bi hevkarîyê tam ligel Hikûmeta Herêma Kurdistanê hatiye amadekirin û di Îlona 2021ê de, Encûmena Wezîran stratejiya rûbirûbûna gendeliyê pesend kir û helwesta xwe di berdehamkirina tedbîrên ji bo pêşxistina şefafiyet, berpirsiyarî û têkoşîna li dijî gendeliyê tekex kir. Di heman demê de wezaret û aliyên peywendîdar hatin raspardin ji bo pêdaçûna cibicîkirina rasperda û pêşniyarên vê raportê bikin, ku di meha Adara îsal de, di civîna Encûmena Wezîran de ji aliyê Serokê Desteya Destpakîyê ve hatibû pêşkêşkirin.

Got jî: "Cihê dilxweşiyê ye ku piraniya daxwaz û raspardiyên ku di vê raportê de hatine behskirin ji bo rûbirûbûna gendeliyê, Kabîneya Nehem a Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji destpêka destbikarbûna xwe ve, kar li ser kiriye û pîlan û bername ji bo cibicîkirina wan daniye, ji wan jî: "Dijîtalîkirina karûbarên hukûmetê û avakirina jêrxaneke bihêz a dijîtal û gavavêtina ber bi hukûmeta elektronîkî ve."

Da zanîn jî: "Pêvajoya dijîtalîki-

rîna xizmetguzarî û karûbarên hikûmetê berdeham e û beşeke

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Daxwaza me ya bihêz ji bo



girîng e ji çaksaziyên hikûmetê ku bêguman dê roleke wê ya bibandor di pêşvebirina zelalî û şefafiyê, nehiştina burokrasiyê û nehiştina gendelî û îsrafa çavkaniyên giştî de bilîze."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî amaje bi wê kir, "Mijareke din a karên me ya ji bo rûbirûbûna gendeliyê, çaksazkirina sîstema bankî û girêdana sazîyên hikûmetê û sektora taybet bi sîstemeke bankî ya pêşketî û nûjen e."

Got jî: "Hebûna sîstemeke bankî ya pêşketî û çalak jî yek ji pêwîstiyên sereke yê jiyana rojane ya xelkê ye. Faktorek girîng a geşepêdana aborî û jîngeheke gunçaw e ji bo geşepêdana aborî û bazirganî û alîkariya kêmkirin û nehiştina gendeliyê dike."

Herwiha diyar kir: "Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî ji bo şefafiyet û dadperweriyê û nehiştina îsrafkirina samanên giştî, bernameyên çaksaziyê cibicî kiriye, kar li ser serrastkirin û pêşkêşkirina çend projeyasayan kiriye, ya herî berçav jî yasaya çaksaziyê ya mûçe, dermale, bexşîn, îmtiyaz û xanenişinan li Herêma Kurdistanê bûye, ku di sala 2020ê de ji Parlamentoya Kurdistanê re hatibû şandin û wê jî pesend kiribû. Di van salên dawî de jî, çend dosyayên gendeliyê hatine lêkolînkirin û bo dadgehên Herêma Kurdistanê hatine şandin.

rûbirûbûna gendeliyê heye, lê ev ne tenê berpirsiyariya hikûmetê û dadgehan e, lê belê, pêwîstî bi hevahengî, hevkarî û piştgiriya hemû welatîyan, hemû beşên civakê, zanîngeh, sazîyên perwerdeyê, mamostayên olî û mediyayê heye. Ew dikarin roleke girîng di hişyarkirina raya giştî û ravekirina metirsiyên gendeliyê de bilîzin. Di heman demê de divê em kar li ser pêşxistin û belavkirina çanda destpakî, rastgoştî û dilsoziyê bikin."

Diyar kir jî: "Her çend e beşek ji kêşeyên rûbirûbûna gendeliyê û bernameya çaksaziyê, destêwerdan û rola aliyên siyasî bûye ku ne tenê hevkarî nekirine, belku hinek alî bi awayekî sîstematîk li dijî hewlên hikûmetê derketine. Lê belê ez welatîyên xweşewîst yê Kurdistanê diîniya dikim ku tevî hemû pîrgirêk û astengî û qeyranan em ê berdeham bin li ser karnemaya çaksaziyê, rûbirûbûna gendeliyê û nehiştina îsrafkirina samanên giştî."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di dawiya gotara xwe de got: "Careke din destxweşiyê li Desteya Destpakîyê dikim ji bo amadekirina vê raportê û her piştvanîyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê jê re tekez dikin, ji bo sîno-darkirina û jinavbirina nexweşiya kujer a gendeliyê li Herêma Kurdistanê."

Pentagon: Li Sûriyeyê 9 hezar girtiyên DAIŞî hene

Berdevkê (Pentagon) Patrick S. Ryder ragihand ku li Sûriyeyê li Sûriyeyê 9 hezar girtiyên DAIŞî hene.

Berdevkê Wezareta Parastîna ya Amerîkayê (Pentagon) Patrick S. Ryder pirsên Berpirsê Ofîsa Rûdawê ya Washingtonê Diyar Kurde bersivandin.

"Li Sûriyeyê 9 hezar girtiyên DAIŞî hene"

Patrick S. Ryder diyar kir ku metirsiya DAIŞê berdeham dike û got:

"Li gorî min, divê çavên me li ser DAIŞê bin û em piştrast bin ku venagere wê asta 2014an.

Hêzên ewlehiyên yê Îraqê ji bo diyarkirina gefên DAIŞê karekî gelekî baş kir.

Li cihekî wekî Sûriyeyê 9 hezar girtiyên DAIŞî hene û divê ev wekî mijareke girîng were nîrxandin.

Em dê ji bo diyarkirina van gefan bi hevbeşên xwe yê Îraqî û yê din re xebatên xwe



bidomînin."

Berdevkê Pentagonê diyar kir ku "rola Amerîkayê ya li Îraqê neguheriyê" û li pey çû:

"Amerîka li cîhanê bi hevbeş û hevkarîyê xwe re dixebite, eger li ser ewlehiya niştîmanî ya Amerîkayê û hevbeşên me metirsiyek hebe em dê bi hev re nîrxandinan bikin da ku ew metirsî werin

nîrxandin."

Divê were gotin ku li Îraqê û Herêma Kurdistanê nêzîkî 2 hezar û 500 leşkerên Amerîkayê hene û hinek aliyên Îraqî dixwazin Amerîka ji axa wan derkeve.

Li hêla din, CENTCOMê jî doh ragihand ku li zêdetir ji 20 girtîgehên HSDyê herî kêm 9 hezar DAIŞî hene.

Omer Şaristênî: Hevkar me radestî kujeran dikin!

Mele Omer Şaristênî ku di merasîma cenazeyê şehîdên Dukanê de axivî, bertek nîşanî êrişê da û



got, "Heta kengî wê destûrê bidin dagirker, xwînxwar û hevkarên ku li ser me planan çêbikin?"

Dewleta Tirk a dagirker bi balafirên bêmirov û biçek, li ser rêya Xelekan- Kanîwetman ya dikeve sînore navçeya Dukan a ser bi parêzgeha Silêmaniyê wesayîtek ya welatîyan bombebaran kir. Di encama bombebaranê de Muzefer Hisên Xidir li gel du kurên xwe Mihemed Muzefer û Mubîn Muzefer şehîd bûn. Xidir û 2 kurên bi merasîmekê girseyî li Goristana Makok ya li bajarokê Hacî Awa ser bi îdareya Raperîn, hatin veşartin. Mela Omer Şaristênî ku yek ji kesayetên pêşeng ê herêmê ye wiha got: "Welatê me ji serweriya xwe bêpar maye û rojane em dibihîzin ku balafirên bêmirov welatîyên me dikin hedef. Ev kes kî dibin bila bibin, divê hesab ji berpirsan were pirsîn. Ma Heta kengî wê destûrê bidin dagirker, xwînxwar û hevkarên ku li ser me planan çêbikin? Rayedar çawa dibe me teslîmî kujerên me dikin û tu kes hesab ji wan napirse." Mela Omer Şaristênî destnîşan kir ku ya giring ne ew e ku di parlamentoyê de çend kursî bi dest bixin, ya girîng girîng parastina serweriya welat û ewlehiya netewe ye û wiha domand: "Em daxwaz dikin ku bila nehêlin xwîna me bê rijandin, sînoren me bîn derbas kirin û zarokên me bibin hedefa dronan."

Binçavkirinên 1'ê Îlonê hatin protestokirin

Meclîsa Ciwanan a DEM Partiyê ya Êlihê binçavkirina 12 ciwanan ya di 1'ê Îlonê de protesto kir û got: Desthilatdarî nikare dengê me qut bike,



têkoşîna me wê li her qadê berderwam bike." Meclîsa Partiya Wêkhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) a Êlihê ji bo 12 ciwanên ku di 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê de hatibûn binçavkirin daxuyaniyê da çapemeniyê. Rêxistinên sazîyên sîvîl, rêxistinên ciwanan û nûnerên partiyên siyasî beşdar bûn. Di daxuyaniyê de pankarta "Zext nikarin me têk bibin" hate vekirin û gelek caran dirûşmên; "Ciwan li vir in li ser piyan e", "Dîsa ciwan dîsa serhildan" berz kirin. Endamê Meclîsa Ciwanên DEM Partiyê Argeş Toparli yê metna çapemeniyê xwend, anî ziman ku endamên wan bi awayekî bêhiqûqî hatine girtin û wiha got: "Em dema ku li dijî şer aştiyê diparêzin, faşizma AKP'ê û MHP'ê li her qadê politîkayên şerê taybet didomîne." Toparli, anî ziman ku politîkayên şerê taybet welatî ber bi kendalê ve dibe û wiha berdeham kir: "Ev desthilatda şer, di serî de ciwan û jinan li ser gelemperiyê civakê politîkayên zextê, çewisandinê û tirsê dimeşîne û dixwaze temenê xwe dirêj bike."

Toparli, destnîşan kir ku parastina aştiyê ya li dijî şer ne sîc e û ev yek anî ziman: "Em dest ji parastina aştiyê bernedin. Bloka desthilatê ya destûra bingehîn nasnake û 12 hevalên me yê ciwan şandin girtîgehê nikare ne dengê ciwanan ne jî dengê aştiyê qut bike. Em vê feraseta ku di her firsendê de êrişî çand, ziman û gelê Kurd dike, tune dihesibîne û qedexê dike, qebûl nakin." Toparli di dawiyê axaftina xwe de destnîşan kir ku ew weke Meclîsê Ciwanan wê li her qadê rêxistinîkirinê xwe bidomînin û li dijî bêhiqûqîyan dengê xwe bilind bikin.

Mesrûr Barzanî: Hêvîdar im pêşangeha HITEX bibe derfetek ji bo zêdetir pêşdebirina Herêma Kurdistanê

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî 5emîn Pêşangeha Navdewletî ya Teknolojiyê ya Hewlêrê (HITEX 2024) vekir.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî gotarek di vekirina pêşangeha HITEX de pêşkêş kir, tê de bixêrhatina beşdarên kir û hêvî xwest ku pêncemîn pêşangeh û konferansa Hitexê "bibe derfetek ji bo zêdetir pêşdebirina Herêma Kurdistanê û girêdana bi bazar û cîhana teknolojiyê re."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Elektronîkirina karûbarên hikûmetê û dijîtalkirina xizmetguzariyên giştî ji bo baştirkirin û bilezkirina asta xizmetguzariyan û nehiştina burokrasî û herdirkirina çavkaniyên giştî, yek ji armancên me yê sereke bûye."

Herwiha Serokwezîr Mesrûr Barzanî Fermangeha Teknolojî û Zanyariyan a Hikûmeta Herêma Kurdistanê, bi yek ji ofîsên herî çalak bi nav kir û got, ew kar ji bo avakirina jêrxaneke dijîtal a bihêz û pêşketî dike.

Diyar kir jî: "Me vê dawiyê stratejiyê veguhertina dijîtal li Herêma Kurdistanê ragihand, bi mebesta pêkanîna hikûmetê dijîtal a nûjen ku dê proseya geşepêdana me ya aborî berfirehtir û bileztir bike, bi awayekî ku welatî bibin navenda giringpêdanê bi rêya bikaranîna teknolojiyê."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekezî li ser girniya hebûna sistemeke bankî ya bihêz, bi bandor û çalak Herêma Kurdistanê kir û got: "Di vî warî de, me dest bi reforma pergala bankê kiriye, da ku bine-saziyek aboriya dijîtal a nûjen û bihêz ava bibe ku bikaribe li gorî pêşkeftinê nûjen tevbigerê."

Serokê Hikûmetê, Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî ji bo dabeşkirina neftê û daxistina nîrxê benzîne peywardar kir

Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê daxuyaniyekî de amaje bi wê yekê kir ku Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê, wezaretê peywardar kiriye ji bo dabeşkirina neftê û daxistina nîrxê benzîne.

Îro 05.09.2024ê Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî bi daxuyaniyekî ragehand, bi amadebûna Wezîrê Çavkaniyên Xwezayî yê bi wekaletê Kemal Mihemed Salih civîneke berfireh derbarê amadekariyên ji bo dabeşkirina nefta spî û daxistina benzîne destpê kir. Herwaha hat ragehandin, Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê di fermanekî de Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî spardiye ku dest bi proseya dabeşkirina nefta spî û dabezandina nîrxê benzîne bê kirin.

Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî diyar kir, di civîna ku bi beşdariya şewirmendan û rêveberên giştî û rêveberên neft û kanayan birêveçû. Wezîrê Çavkaniyên Xwezayî gotûbêj li ser destpêkirina dabeşkirina nefta spî kiriye, ji vî alî ve Wezaretê Çavkaniyên

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got di xizmeta mirovahiyê de bikar jî: "Ez dikarim bibêjim ku em niha li bînin."



ser rêya rast a guhertin û çak-saziyê ne di warê teknolojiyê û dijîtalkirina karûbarên bankî û darayî de, ku dê karsaz û veberhênerên li navçeyê û li seranserê cîhanê bêtir han bide ku bîn Herêma Kurdistanê."

Herwiha got: "Herêma Kurdistanê ji bo dijîtalkirina karûbarên hikûmetê gavên baş avêtine. Bi pêkanîna stratejiya veguherîna dijîtal, dê di gihandina karûbarên giştî de ji welatîyên me re, bi şewazekî bilez û pêşkeftî guhertinek kalîte pêk were."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Îro, şoreşa teknolojiyê û jîriya çêkirî, werçerxaneke mezin di jiyana me de di her warî de çêkiriye, çî di warê ragihandinê de, hem jî di perwerde, tenduristî û karsaziyê de. Bêguman karwana guhertin û pêşkeftinê berdeham û bilez e û divê em kar bikin da ku bi baştîrîn awa jê sîd werbigirin û xwe ji bo kêşe û pirsgerêkên ku rûbirûyê me dibin amade bikin. Ji ber ku her çend teknolojiyê jiyana me hêsantir û xweştir kiribe jî, divê em wê bi aqilmendî û berpirsiyarî

Amaje bi wê jî kir, "Dema ku min vê sibê serdana vê pêşangehê kir, ez bi rastî serbilind bûm ku ciwanên me di asteke weha bilind de karîne di warê teknolojiyê de ewqas pêşde biçin. Wan gelek kompaniyayên xwe ava kirine û dahênan kirine û gelek ji van bernamayan bi xwe afirandine. Di axaftinê xwe yê li gel çend ji wan de, ez gelek kêfxweş bûm ku min bihîst ku hinek xizmetên dijîtal ên ku wan çêkirine, ne tenê li Kurdistanê, lê li navçeyê jî dê sîdmend bin û bi rêya vê sîstema dijîtal a ku wan ava kiriye, dê li cihên din bîn bikaranîna pêwendiyê rasterast û baştir bi Kurdistanê re were danîn, ku ew jî rêyêke din a naskirina Kurdistanê bi cîhanê be."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di dawiyê gotara xwe de got: "Careke din spasiya we dikim, spasiya amadekarên vê pêşangehê dikim û spasiya hemû kompaniyên beşdar di vê pêşangehê de dikim. Careke din bi xêr hatine, her tim serkeftî û sax bin, bila Kurdistanê me jî avedan bimîne."



Xwezayî amadekariyên xwe destpê kir, ku demekî nêzik de, destpêkê li navçeyên çiyayî dest bi dabeşkirina nefta Hikûmeta Herêma Kurdistanê bê kirin.

Mijareke din a civîne taybet bû derbarê kêmkirina nîrxê benzîna ku bi cureya normal û anîna benzîna zêdetir a bazirganiyê û vî alî ve dest bi pêngavên proseyê dê bê kirin.

Civîne de biryar hate dayîn şandeyekî Wezaretê serdana


Wezaretê Petrola Iraq a Federal bike, ji bo diyarkirin û wergirtina beş û pişka Herêma Kurdistanê ya nefta spî û benzîna û hin pirsgerêkên din jî gotûbêj bike.

Wezaretê Çavkaniyên Xwezayî di zivistanê bofî de bi awayekî serkeftî karî sotemeniya pêwîst a nefta spî û benzîna û gaza malan ji bo parêzgehan û îdareya serbixwe dabîn bike û ji bo demsala zivistanê îsal jî dest bi amadekariyan hatiye kirin.

Yilmaz Guney

Efsaneya Kurda ku tu carî nayê ji bîrkirin.

Îro 9.09.2022ê salvegera 38' mîn ya koça dawî ya nivîskar, romannivîs, lîstikvan û derhênerê Kurd ê navneteweyî Yilmaz Guney e, ku di roja 9.9.1984 'an de li Parîsê koça dawî kir.



Li gundewarê bajarê Edeneyê ku 27 km dûrî wî bajarî dikeve, li gundê İncâ, hunermend û efsaneyê kurd Yilmaz Günî ji dayîk bûye, ku yek ji mezintîrîn zanayarên derhênerî û lîstikvaniya sînemayê ne tenê li ser asta Kurdistan û Tirkîyê û herwiha li ser asta hemû cîhanê.

Ew ji dê û bavên kurd hatiye dinê, bavê wî "Hemîd Bûtûn" e ku zazayî ye bi eslê xwe ji Sivriçê ye û diya wî Gulê ji Vartoya navçeya Mûşê ye.

Yilmaz Guney piştî ku xwendina xwe ya lîse qedand, di sala 1956 'an de tevî Koleja Hîqûqê li Zanîngeha Enqereyê dibe û ji ber şert û mercên zehmet ên malbata wî xwendina xwe ya zanîngehê temam nekir, dev ji zanîngehê berda û vegeya Adeneyê û dest bi kar kir, ji bo alîkariya malbata xwe re bike.

Di sala 1957'an de wek alîkarê derhênerê filmê (Kurên vî welatî) ket nav cîhana sînemayê.

Tenê 47 sal jiya, ji wan 11 sal di zindanê de û çend sal di sirgûna bi darê zorê de ma.

Tevî jiyana xwe ya kurt Yilmaz Guney, senaryoya 53 filman nivîsiye, di 110 filman de cih girtiye û derhêneriya 17 filman jî kiriye.

Yilmaz Guney di warê wêjeyî de (edebî de) bi sedan kurteçîrok nivîsandine û xwediyê çar romanên navdar e (Stûxesrî an Ew mirin bi serşorî - Salba - Hucreya min û tawanbarî).

Di sala 1970 de, romana wî ya bi navê "Stûxwarî" xelata Orhan Kemal wergirt, ku li Tirkîyê xelata edebî ya herî bilind e, û romana wî "Salba" ya ku ji bo Xelata Nobelê ya Wêjeyê hat hilbijartin, di sala 1973an de dema ku li zindana Selîmê nivîsandibû, ew romana wî bû sedema ku 18 mehên li girtîgehê de bimîne ji hêla rayedarên tirk bi sîwdariya "rewşenbîrê sor".

Yilmaz Guney 17 xelatên sînemayê yê li Tirkîyê û derveyê welat wergirtin, di nav wan de Xelata Mezin a Festîvala Filman a Navneteweyî ya li Locarno ya Swîsreyê, bi filma xwe ya bi navê "Kerî" di sala 1981 de wergirt, herweha Xelata Palmiya Zêrîn wergirt bi navê filma "xwe ya bi navê" "RÊ_YOL" di Festîvala Filman a Kan de di sala 1982an de, Filma wî behsa jiyana dijwar a herêmên bakurê Kurdistanê dike û nivê vê filmê di dema ku di girtîgehê de bû derhêneriya wî kiriye, her wiha çend filmên xwe di girtîgehê de nivîsîn û derhênerî ji wan re kir.

Yek ji girîngtirîn taybetmendiyên filmên wî yê sînemayî, rasteqîn û ronîkirina êş û azarên gelên di bin siya rejîmên mêtînger û stemkarî de dijîn.

Di payîza sala 1982an de Yilmaz Guney dest bi kişandina filma xwe ya dawîna ya bi navê "Dîwar" kir, bi awayekî rasteqînî tiştên li girtîgehê Tirkîyeyê diqewimîn nîşan dide ku serhildana girtiyan dibe sedema bê hêvîbûnê û desthilatdarî wan dipercîqîne.

Yilmaz Guney di 12.10.1981ê de ji zindanê Tirkîyê reviya û berê xwe da Swîsreyê ji bo mafê penaberiyê bigire, lê qebûl nekirin, ji ber wê jî ber bi Fransayê ve çû, Fransa ew hembêz kir û dilrihet kir, lewra bi jîneke fransî re zewicî ku piştgirîya wî dikir, û ji bo wî zemînek afirîneriyê çêkir, wê demê Goney dest bi hilberîna filmên xwe kir bi riya beşgeha xwe ya taybet.

Yilmaz Guney, mîna ku bi demê re di nava têkoşînê de be, an jî zanibe ku jiyana wî kurt e, kêliyêk jî di afirîneriya xwe de ranewestiya û di dîyalogên xwe yê dawî de wiha gotiye: (....armanca min ya jiyane ne hunerî bû, lê hewldanek bû ku bi vê hunerê gelê xwe azad bikim.....)

Li Parîsê, bi taybetî di 9/9/1984 de, perde li ser jiyana wî afirînerê mezin hat xwarê ku li gel mezinan li goristana "Pierre Lachaise" were veşartin û gelek kesayetên siyasî yê navdar ên Fransa beşdarî rê û rismê (merasîmê) cenazeya wî bûn.

Hin ji filmên wî yê herî navdar: (Kerî - Rê - Hêvî - Firar - Kabûs - Bav - Feqîr - Gurên birçî - Dijmin - Mirovê pîs - Sîperê birîndar - Şahê padîşahan - Dema titûnê - Seyîd xan - Kurên vî welatî û Dîwêr).

Hezar rehmî li giyanê wî yê pak û temîz be.

Gava desthilatdaren me Kurdan berjiwendiyên kesayetî û hestên xwe yê dinê di ser yê Kurdîtiyê de bilintir negirtina, wê Kurdistan jî vêga welatekî rizgar bûna

Weke em dibînin, bi dehan nivîskar, rewşenbîr, dîrokzanên xerîb û me Kurdan li ser dagirkirina welatê me, belabûn û asimlebûna miltê me nivîsandin e. Kesê ku dîroka Kurdî nasdike, nav-dengê medrese, camî û dibistanên ku dagirkerên Kurdistan bi taybetî jî "mekteba eşîran" ji bo zarokên mîrek, serokeşîr(beg) û axayên Kurdan vekirine, ne bihîstibe tûne. Gelek ji lêkolîneran vêga jî dibêjin, gava mîrek, serokeşîr(beg) û axayên Kurdan yê ku ji bo berjiwendiyên kesayetî û malbata xwe diçûn digihîştine dujminên gelê xwe, dagirkeran pêşîn ew di xwandegehên artêş, "mekteba eşîran" û mizgeftên xwe de, bi nîzam û zimanê desthilatdariya xwe perwerde dikirin. Ew ji bo pêwendiyên bi kes û xelqên ku hêja dînan jî desthilatdariya wan nas nekirine jî, fêrî axaftina bi zimanê Kurdî dikirin.

Ez jî li goriya dîtina xwe dibêjim, gava ew xwandevanên zarokên mîrek, serokeşîr(beg) û axayên ku ji ol-nijada xwe dûrketî diahtine nav herêmên Kurdistanê, ewan di bin navê serleşker, amîr, zabit, walî, qaymeqam û berpirsyarê dewletê muxbirtî dikirin. Ewan ji her desthilatdarî bêtir jî rîşwet-baca zêde ji oldar, serokeşîr(beg) û axayên civaka ol û kêr netewên dinê standine. Zilm û zor li bav-kalên me kirine. Ewan hercar îdolojîya dagirkeran di rêya dezgehên ragihandinên yê weke çapemenî, radio, tv, şanogerî, sînemayê û hwd. de beladikirin. Hemû kesên ku ne weke wan difikirîn, bi darê zorê koçberî deverên dinê û ceza dikirin. Qet giringî ne didane hasesiyet û şerefa civaka Êzdî, ol û kêr netewên dinê.

Bêguman, hinek serokeşîr(beg) axa, malmazin, olperest û kevneperestên Kurdperwer ne hevalên wan kesên ku ji bo berjiwendiyên kes, malbata xwe bûne muxbîr, muftî, keya, eza û bekçiyên nebiyên Jon Tirkan û ji wan menfaatçiyên ne razîbûne. Ez wan birêzan jî li virê bi hurmet bibîrtînim.

Lê gava ku, piraniya desthilatdar û bazirganên me Kurden Êzdî, Asurî, Misilman, Alewî, Yarasan, Ehlî-Heq, Şebek û hwd. zêde girîngî bidana bizava welatperwerî, nasnama xwe ya xwezayî û ew bi fatwa, nişîst, fahlik, çîrok û xewnên metîngehkarî nehatina xapandin, bipîştewaniya şaristanî û ola hukimdarî ne kirina;

wê Ecem(Farizî)an nikarûbuna dînê Zerdestîyê li ser piraniya desthilatdarên Îparatoriya Medan ferz bikirina û hinek Kurdan jî ne gotina, „Zerdestî (BZÎ 628-551) Pêxemberê me ye“.

General, filozof û helbestvanê Yunan Ksenofon nikarûbuna di salên 570 yê beriya zayîna İsa(BZÎ) de tevî 10.000 leşkerê xwe û Alesksanderê mezin(Eskenderê Çarqurne-Makedonî) di BZÎ 331 de jî nikarûbuna dewlemendiyên Kurdistanê ji xwe ra bibirina û Kurdistan wêran bikin.

Mihemedê kurê Abdallah nikarûbuna di sala 632 ya piştî zayîna İsa(PZÎ) de li bazaren Qudîsê, Mekê-Medîne û Ekazê bibûna Pêxember. Kurdistan ji aliyê hêza İslamê ve ne dihate bindest kirin û kolonyalîstên ereb û farsî pêş ve neçûna.

Xanedaniya Xelîfen Emewî û Abbasiyan nikarûbuna di salên 660-

750 de Kurdan û herî zêde jî Êzdiyan bi zora şûr misulman bikirina.


Xanedaniya Silatnên dewleta Selçûkiyan, wê nikarûbuna di şerê Malazgirtê yê sala 1071 de serokê artêşa Bizansî Romanos IV dîlbigrin.

Bawermend, oldar, serokeşîr(beg) û axayên civaka Êzdiyan ji ber zilm-zora dagirkerên Kurdistanê, „zanyarê sofîgerîyê (tesewuf) Şêx Adî bin Misafir [1073 (1078) – 1162] de wek Xwedê û Tawîsî-Melek ne dane xwanêkirin.“

Selahedîn Eyyûbî, di şerê li dijî Xaçparêstan yê di sala 1169 PZ de ne dibû silatanê dewleta Eyyûbî.

Nijadperestên Tirkan(nebiyên Oxizan û kurê Guran) nikarûbuna ji Asyaya navîn(Mongolanistan)ê derbasî nav Anatolya yê bivin û di 1200 de dewleta Osmanî bidamezirînin.

Qanûnî Siltan Silêman nikarûbuna




di sala 1534 de mîrîtiya herêma Soran, Bahdînan, Şengal, Heleb, Kilîs û Mereşê ji bin destên Mîrekên Êzdî derxîne.

Kurdistan di sala 1639 de, bi Peymana Qasrî Şêrîn ji aliyê bisilmanan desthilatdaren dewleta Ecem(Safewî-Îran) û Osmanîyan ve ne bûna du perçe.

36 Silatnên Împaratoriya Osmanî nikarûbuna bi xêra propagandaya "biratîya dînî" ji salên 1200 heta 1922 li ser hukimdariya welatê Kurdistanê bimana.

Mîr Mihemedê Kor mîrê Rewandîzê, nikarûbuna Mîrê Êzdîxanê Elî Begê di sala 1832 bikuje, Reşî Mehmed Paşayê Osmanîyê jî nikarûbuna di şerê sofîyên Misilmanan û feqîrên Êzdiyan de, Êzdiyên li welatê Xaltîya qirbîke, Bedirxan begê mîrê Cizîra Bota jî nikarûbuna di sala 1835 de bi xêra fanatîzma "biratîya dînî" bibûna „paşayê“ dewleta Osmanî, „Seyda-Melayê Kurdperwer“ û mîna paşayên Osmanîyê xiznên xwe bi xêra firotina jin-qîzên Êzdiyan yê ku li kuçe û soqaqên Cizîrê, Şamê, Kilîsê, Musilê, Tebrîzê, Bexdayê û hwd. dihatine firotan, ji malê Kurdên Êzdî û civatên din yê etnikî danegirtina.

Desthilatdar û rêvebirên Osmanîyê nikarûbuna di sala 1859 de bi „qanûna xwedîtiya mal-milk“ hemû milkê Kurdên Êzdî û civatên din yê etnikî, bixîne nav xizna dewleta xwe an jî bi qelêbine ser navên begên Kurd û fanatîkên biratiya ola Misilmanetiye diparastin û navên cih-war, bav-kalên Kurdên Êzdî û civatên din yê etnikî ne dihatine guhastin.



Piraniya Kurdên Êzdî yê ku li herêma Wanê, Qersê, Bazîdê û yê li hemû der dora tevaya çiyayê Araratê diman, di wextê cengên di navbera Împaratoriya Rûsiya yê û Tirkîyê (1768, 1877 û hwd.) de nereviyana nava Anatolya navîn û dewleta Rusya yê.

Leşkerên artêşa Rus, Ecem, Ereb û Osmanîyan(nebiyên Oxizan-, Alayên Abdul Hemîd û hwd.) nikarûbuna heta îro hêjî endamên ne ji ol û netewa xwe ne qirbikirina.

Mustefa Kemalê Selanîkî û nebiyên Oxizan(Tirkên nijadperest) jî di leystik, plan, xebat û têkoşîna "Komelên Parastina Mafên Huqûkî û Neteweyî"- (Müdafaa-i Hukuk-u Milliye Cemiyetleri) de bi ser nekevtina, Kurdistan cardîne di sala 1923 de bi Peymana Lozanê nebûna çar perçe û ewê heta îro hêjî bi xêra "biratiya İslamî" ne li ser desthilatdariya welatê me bûna.

û hwd.

Weke ku min di van çend mînakên de daxwanê; eger piraniya mîrek, serokeşîr(beg) û axayên Kurdan ji bo berjiwendiyên kes, malbat û dînê xwe yê nû zilm-zor li mîrek, serokeşîr(beg) û axayên Kurdperwer nekirina û hestên dînê xwe yê nû di ser yê Kurdîtiya xwe da ne girtina, wê Kurdistan jî vêga mîna her welatekî rizgar bûna. Ez baş bawerim, lewma jî rêzdar Ahmedê Xanî, beriya sedsalan ji ber vê bêti-faqiya me Kurdan di „Mem û Zîn“ a xwe da weha gotiye:

**„Ger hebûya me îtfaqek,
Vêkra bikira me inqiyadek,
Rom û ereb û ecem temami,
Hemîyan ji mera dikir xulamî,
Tekmil dikir me dîn û dewlet,
Tehsil dikir me hukmet,
Ternir dibûn ji hev miqalet,
Mumtaz dibûn xudan kemalet.“**

Hêvîdarim ku, rêvebir, rewşenbîr, berpirsyarên hemû dezgeh û rêxistinên Êzdîtî, Misilmanetî, Alewîtiyê û civatên din yê etnikî vê dijîmantîya ku dagirkerên Kurdistanê, li ser navê parastina ola İslamê, Ehlî-î Beyt, netwîya Tirkî(bi taybetî jî Kemalîzmê), Erebî, Farsî û hinek Kurdên mejîşûştî xistine nava mejîyan nasbikin. Em bizanibin ku, em Kurd tev mîna sêvên ji darekêne û em jî mezîna bawerî(dîn û dîtina siyasî)ya xwe di ser ya netewîya xwe de bilintir negirin û divê em jî weke rêzdar Osman Sebrî gotiye bibêjin:

**„Em bira tev hemî bo çi ev gir û kîn
Sor û gewr, reş û zer em yek in tev bira
Hemîyan yek rê ye, yek raman, yek çira
Mesîhî, Mûsewî, Misilman hemdem in
Mecûsî, Yezîdî tev kurrên Adem in
Me divê aşîtî naxwazin şer û bend
Bimirin koledar şerxwazên dewlemend
Her bijî aşîtî, aşîtxwaz bijîn
Serbilind, serfiraz her wekî baz bijîn“**

**Kemal Tolan
05.11.11**

**Berhevkarê kevneşopên Êzdiyatîyê.
Ev gotara di rûpelên: 234-237 yê vê
pirtûkê de hatiye weşandin**

Mesrûr Barzanî: Ez spasiya sektorên taybet dikim ku di dema qeyranan de roleke niştîmanperwerane hebû

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 04.09.2024 li ser hesaba xwe ya tora



civakî ya Xê nivîsî, "Ez spasiya Sektorên taybet ê Herêma Kurdistanê dikim ku di dema qeyranan de roleke niştîmanperwerane hebû û alîkara hikûmetê bû ji bo ku em zêdetir xizmeta welatiyan bikin." Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî her îro di merasîmên pêşkêşkirina xelata rêzêgirtinê ji bo hejmareke weberhênerên Kurd de ragehand, "Min rêz û hurmet hene ji bo rolê berpirsyanane yê weberhênerên Herêma Kurdistanê li salên borî di alîkarîkirin û piştevanîkirina Hikûmeta Herêma Kurdistanê û karnameya wê ya çaksaziyê de, bi awayekî ku Sektorên giştî û Sektorên taybet temamkerên hev bûn û pêkve çend pirojeyên girîng û stratejîk bi cih anîn."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî herwesa got, "Li salên borî em rûbirûyî rewşeke giran a darayî bûn, spas ji bo xweragiriya welatiyên xweşevî yê Herêma Kurdistanê û piştgirî û piştevaniya weberhêneran, me karî ji hejmareke zêde ya wan arêşe û astengan derbaz bibin û berdeamiyê bidin bernamê û pirojeyên hikûmetê, bi awayekî ku me heta niha kariye berdeyam bin û rûbirûyî wan hemî qeyranan jî bibin."

Mesrûr Barzanî tekez jî kir, "Armanca me ya serekî pêşxistin û avakirina jêrxaneyêke bihêz a aborî ji bo Herêma Kurdistanê ye, herwesa em dixwazin deverên din ên Iraqê jî pêş bikevin. Iraq bi samanên xwezayî, mirovî û madî welatekî zengîn e û dahateke zêde jî heye, lê mixabin ji ber nebûna birêvebirineke baş û xizmetkar, niha welatiyên Iraqê di rewşeke xirab de ne û ji wê dahata zêde û zebelah mifadar nînin."

Bi Kurmanciya Gewir: Xewek Li Doda.. Li Cihê Berî 50 Salî



K o n ê R e ş

Çûn û hatina min ji mala me a li gund/ Doda, qut nebûye.. Belê ji berî 50 salî ve, ku di havînan de li ser banê xaniyê me li gundê Doda radizam, ranezame.. Berî çend rojan, wek her carê digel du birayên xwe çûm gund, min biryar stand ku wê şevê wek havînen berê, li ser banê xanî, cihê berê razêm..

Wê şevê civaka min baş dirêj kir.. Gundî zû radizên.. Piştî civak ferikî, her yek çû mala xwe, ez jî hilkişiyam ser banê xanî, nav livînen ku ji min re raxistibûn.. Ji ser banê xanî, di nav reş û bêdengiya şevê de awirên min ber bi asman ve çûn, min dît ku çawa stêrk di asman de dilîzin.. Qet min ew pîrbûna stêrkan di asmanê Qamişlo nedîtine.. Di nav wî asoyê bêdengiyê û kurbûna gund de, bi tenê hin caran dengê reyandina sehan dihat bihîstin.. Bi mêzekerina li çarhawêrî gund re, rojên biçûkaniyê hatin bîra min.. Min çixareyek vêxist, çend miz jê kişandin û berê xwe da Bakur/ Serxetê û ji xwe re ponijîm..

Bi mêzekerina Bakur re, ronahiyên bajarê Mêrdînê û hin gundên çiyayê Omeryan xweş xuya dikirin.. Bi ponijandina di çiyayê Omeryan de nivîskar Şerefxanê Cizîrî û pirtûka wî (Omeriya Mîrsom), hatin bîra min, hem jî

